ÇÎROKA ZAROKAN

BERFESPÎ

Hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibarin li hazir û guhdaran.

Dibêjin carekê nîvê zivistanê bû, kuliyên berfê ji asîmanê lepelep dihatin xwarê. Qralîçeyek li ber paceya ji dara ebenozê rûniştibû û tiştekî didirût. Wê hem didirût, hem jî carina li kuliyên berfê dinihêrt. Ji nişka ve derzî di tiliya wê re çû û sê dilop xwîn niqutîn ser berfê. Rengê sor li ser berfa spî wisa xweş xuya dikir ku Qralîçeyê di dilê xwe de got:

--Ax, ax! Xwezî zarokeke min jî çêbûya! Zarokek mîna berfê spî, lêva wê mîna xwînê sor û porê wê jî mîna dara paceya min a ebenozê reş bûya.

Piştî demeke kurt, keçek ji qraliçeyê re çêbû; û keçik mîna berfê spî, lêvê wê mîna xwînê sor, porê wê jî wek dara ebenozê reş bû. Û navê Berfespî lê hat danîn. Lê belê qralîçeyê piştî ku keça xwe anî dinyayê, çavê xwe girt û çû dilovaniya xwe. Salek derbas bû, û qral bi jineke din re zewicî. Ev jinik pir delal bû, lê pir qure û pozbilind bû, û qet tehemûla wê tunebû ku yeke din jê delaltir be li dinyayê. Neynikeke wê ya bisihir jî hebû û dema ku wê li neynika xwe dinihêrt, jê dipirsî digot:

--Neynikê, neynika delal
Kî ye ya herî bedew, li vî welatî?

Neynikê jî wiha bersiva wê dida:

--Qralîçeya min, tu yî ya herî bedew, li vî welatî.

Hingê pir kêfa wê dihat. Û wê baş dizanibû ku neynik jê re rastiyê dibêje.

Di wê navberê de jî Berfespî her ku diçû mezin û xweşiktir dibû. Û dema ku Berfespî gihîşt hivdeh saliya xwe, ew ji qralîçeyê bedewtir bû. Rojekê, qralîçeyê dîsa çû li ber neynika xwe ya bi sihir sekinî û jê pirsî:

--*Neynikê, neynika delal*
Kî ye ya herî bedew, li vî welatî?

Neynikê jî wiha lê vegerand:
--*Qralîçeya min, tu yî ya herî bedew, li vî welatî*
Lê Berfespî bedewtir e ji te bi hezar carî

Qralîçe bi bihîstina van gotinan di cihê xwe de cemidî, ji hesûdiyê reng lê nema. Ji wê kêlî û şûn de, her cara ku wê Berfespî didît, kerba dilê wê radibû û jê zêdetir nefret dikir. Çavnebarî û pozbilindî êdî di dilê wê de bûbûn mîna giyayên jehrîn û şev û roj lê heram bûbû.

Dawiyê, qralîçeyê gazî nêçîrvanekî kir û jê re got:

--Zû here keça qralî bibe daristanê. Ez êdî naxwazim wê bibînim. Divê tu wê bikujî û pişik û kezeba wê bi destê xwe derxî û ji min re bînî, ji bo ez bizanibim ku ew bi rastî jî miriye.

Nêçîrvan bi ya wê kir û bi mebesta gerê Berfespî bir daristanê. Lê dema ku wî dest avêt tîr û kevanê xwe, ji bo ku li dilê pak ê keçikê bide, Berfespiyê dest bi giriyê kir û got:

--Ez ketime bextê te nêçîrvanê delal!, destê xwe nexe xwîna min, bihêle ez bijîm. Ez ê herim xwe bigihînim cihê herî kûr ê daristanê û ez ê tu caran venegerim malê.

Ji ber ku keçik pir şîrîn û delal bû, dilê nêçîrvan pê şewitî û jê re got:

--De here bazde, xwe xelas bike keçika delal !

Nêçîrvan di dilê xwe de jî got: “çawa be heywanên hov ên daristanê wê aniha te bikujin.” Lê tevî her tiştî, dilê nêçîrvan rehet bûbû, ji ber ku wî bi destê xwe, dawî li jiyana keçikê neanîbû.

Tam wê demê, berazekî kûvî ji wir derbas dibû. Nêçîrvan hema bi derbekê ew beraz kuşt û pişik û kezebên berazî derxistin û ew wek îsbata mirina Berfespî, ji qralîçeyê re birin. Bi fermana qralîçeyê, xwarinpêj jî ew pişik û kezeb pijandin û qralîçeya dilreş ew tevde xwarin. Ew wisa fikirîbû ku pişik û kezeb aîdê Berfespî ne.

Keçika reben jî bi tena serê xwe di nav daristanê de ma. Tirsa wê her diçû zêdetir dibû û feqîrê nizanibû ka bi kîjan alî ve here. Wê dawiyê dest bi bazdanê kir, di ser kevirên tûj û di nav giyayên bidirrî re derbas bû. Heywanên hov û dirinde li dora wê tijî bûn, lê wan tu xirabî bi serê wê de neanîn. Berfespî heta êvarê, heta ku hal di piyên wê de nema bazda bazda. Axir ew çû gihîşt ber maleke biçûk û ji bo ku hinek bêhna xwe vede kete hundir.

Li wê malê her tişt biçûçik, paqij û şîrîn bû. Li aliyekî, maseyeke biçûk a bi rûberekî spî nixumandî hebû. Heft sênîk, heft kevçî, heft çetel û heft kêr, tevî heft qedehên biçûçik li ser maseyê hatibûn danîn. Li aliyê din jî, heft nivînên biçûk li kêleka hev hatibûn rêzkirin û rûberên wan jî sipspî bûn. Berfespî wisa tî û birçî bûbû ku ew çû ji her sênîkê piçikek xwarin xwar û ji her qedehê jî piçikek şerbet vexwar. Çimkî wê nedixwest xwarin û vexwarina tenê kesekî bi temamî xelas bike.

Berfespî wisa westiyabû ku piştî xwarinê xwest hinek razê. Lê belê ew ê di kîjan nivînê de razaya? Yek an pir kurt, yek jî an pir dirêj bû. Keçikê hemû nivîn yeko yeko ceribandin. Dawiyê ya heftemîn li bejna wê hat. Wê jî xwe li ser dirêj kir û ket xeweke giran.

Gava ku dinya tam bû tarî, malxwêyên malê vegeriyan hatin. Malxwê heft cûce bûn û ew li çiyê, li kanên madenan dixebitîn. Heft cûce dema ku ketin

hundir, heft lampeyên xwe yên biçûk pêxistin û dema ku ronahî ode ronî kir, wan ferq kir ku yek hatiye ketiye hundir; ji ber ku tu tişt ne weke berê bû.

Cûceyê yekemîn got: Kî li ser kursiya min rûniştiye?

Yê duyemîn got: Kê ji sênîka min xwariye?

Yê sêyemîn got: Kê ji nanê min xwariye?

Yê çaremîn got: Kê ji şînahiyên min tahm kiriye?

Yê pêncemîn got: Kê çetela min bi kar aniye?

Yê şeşemîn got: Kê bi kêrika min jêkiriye?

Yê heftemîn got: Kê ji şerbeta min vexwariye?

Dû re yê yekemîn li pişt xwe nihêrt û dît ku nivîna wî ne wek berê ye.

Got: Kê nivîna min xira kiriye?

Yên din jî bi bazdan çûn li nivînên xwe nihêrtin û tev bi hev re qîriyan gotin:

--Di ya min de jî yekî xwe pal daye!

Lê belê dema cûceyê heftemîn li nivîna xwe baş nihêrt, dît Berfespî tê de razaye. Wî gazî yên din kir, ew jî bi lez û bez hatin û şaş û metel man. Piştre jî ew çûn heft lempeyên xwe yên biçûk girtin, anîn dan ber rûyê Berfespiyê û bi dengekî bilind gotin:

--Xwedêyo, ev çi keçikeke delal e !

Kêfa cûceyan wisa jê re hat ku êdî dengê xwe nekirin û hiştin ku Berfespî xewa xwe baş bigire. Cûceyê heftemîn jî heta serê sibê her saetê carek, çû cem hevalekî xwe raza û ha wisa ew şev derbas bû.

Serê sibê, Berfespî ji xew şiyar bû. Dema ku wê heft cûce li ser serê xwe dîtin, feqîrê ji tirsan veciniqî. Lê belê wan bi dil û rûyekî geş lê dinihêrt, û jê pirsîn gotin:

--Navê te çi ye?

Wê got:

--Navê min Berfespî ye.

Cûceyan got:

--Tu çawa hatî heta vê derê?

Berfespiyê hingê behsa jinbava xwe kir û got ku jinbava wê xwestiye ku wê bikuje, lê belê nêçîrvanê dilpak ew nekuştiye û hiştiye ku ew jiyana xwe bidomîne. Piştre jî wê ji ber tirsa xwe bi saetan di daristanê de bazdaye û dawiyê hatiye gihîştiye vê malê.

Cûceyan got:

--Eger tu bikaribî karê malê bikî û ji me re xwarinê çêkî, eger tu her tişt rast û paqij bikî, tu ê bikaribî bi me re bimînî. Bi vî awayî, tu ê li vê derê her tim baş û rehet bî.

Berfespiyê got:

--Belê, belê, ez bi dil û can qebûl dikim.

Û Berfespî li ba wan cûceyan ma û bi kar û barê malê re eleqedar bû.

Her roj serê sibê cûce diçûn çiyê, da ku ji kanên madenê hesin û zêr derxin, êvarê jî vedigeriyan dihatin malê. Berfespî jî nava rojê, li malê bi tena serê xwe dima; ji ber wê, cûceyan lê tembî kiribû û gotibû:

--Nebe nebe tu bawerî bi jinbava xwe bînî ha! Di nêz de wê haya wê çêbe ku tu li vir dijî, ji ber wê divê tu nehêlî kes were hundir !

Li aliyê din, qralîçeya dilxirab jî piştî ku pişik û kezeba ku nêçîrvan jê re anîbûn da pijandin û xwarin, êdî wê wisa bawer dikir ku ew bedewtirîn a jinan e. Wê digot qey nêçîrvan bi rastî jî Berfespî kuştiye. Û bi wê kêfxweşiyê qralîçe dîsa çû ber neynika xwe ya bisihir û jê pirsî:

--Neynikê, neynika delal

Kî ye ya herî bedew, li vî welatî?

Neynikê jî wiha bersiva wê da:

--Qralîçeya min, tu pir bedew î li vî welatî

Lê bedewtir e ji te Berfespî bi hezar carî
Ew ligel heft cûceyên biçûk û delalok
Li wî aliyê çiyayên madenan dijî

Li ser vê gotina neynikê, qralîçe şaş û metel ma, wê baş dizanibû ku neynika wê qet derewan nake. Hingê wê fam kir ku nêçîrvan ew xapandiye û Berfespî hê jî dijî. Ew dîsa ket nav fikir û ramanan, da ku riyeke din bibîne ji bo ji Berfespiyê xelas bibe. Çimkî heta ku qralîçe bi xwe nebûya ya herî bedew, heta ku yeke din jê bedewtir bûya, wê baş dizanibû ku hesûdiya wê dê şev û roj lê heram bikira.

Dawiyê, wê planek çêkir; rabû rûyê xwe bi boyaxan guherand û wekî pîrejineke gundî cil û berg li xwe kirin. Wê xwe wisa guhertibû ku êdî tu kesî nikaribû ew nas bikira.

Îca wê rabû berê xwe da wan çiyayên ku heft cûce lê dijîn û dawiyê gihîşt ber mala Berfespiyê. Wê li derî xist û got:

--Min çi tiştên xweşik anîne !, ka li van binêrin, li van!

Berfespiyê ji paceyê nihêrt û got:

--Rojbaş xanima delal, tu çi difiroşî?

Pîrê lê vegerand got:

--Tiştên xweşik û rindik difiroşim. Ka li vê kembera xweşik û rengorengo binêre.

Berfespiyê di dilê xwe de got:

--Çi jineke baş e ev ! Ez dikarim wê bigirim hundir.

Berfespiyê derî vekir û wê kembera spehî jê kirî.

Pîrê got:

--Ez qurbana te. Ka bihêle ez wê li pişta te girê bidim.

Berfespiyê tiştekî nebaş qet neanî bîra xwe û hişt ku pîrê kemberê li pişta wê girê bide. Lê belê pîrê ew kember bi lez û bez li pişta keçikê girê da û şidand şidand, heta ku bêhn li Berfespiyê çikiya û dawiyê feqîrê bêruh ket erdê.

Îca Pîrê ji wê derê bi reverev bazda û di ber xwe de jî got:

--De haydê em bibînin, êdî tu ê çawa bibî ya herî delal, ha ha ha!

Ber bi êvarê heft cûce vegeriyan hatin malê. Gava ku wan dît Berfespiya wan a delal li erdê, bêruh dirêjkirî ye, tirs û saweke ecêb kete dilê wan. Wan ew ji erdê rakir û dîtin ku kemberek li pişta wê hatiye girêdan û zêde zêde hatiye şidandin. Wan hema bi zûzûka kembera pişta wê vekir û bêhna keçikê hêdî hêdî derket û hinek bi ser xwe ve hat. Dema ku cûce hîn bûn ka çi qewimiye, fam kirin û gotin:

--Ew jinika çerçî, hebe tunebe qralîçeya zikreş e. Hay ji xwe bimîne Berfespiya delal! Dema em ne li vir bin divê tu ji tu kesî re derî venekî !

Qralîçeya dilreş dema ku vegeriya koşkê, çû li ber neynika xwe ya bisihir sekinî û jê pirsî:

--Neynikê, neynika delal
Kî ye ya herî bedew, li vî welatî?

Neynikê jî wiha bersiva wê da:

--Qralîçeya min, tu pir bedew î li vî welatî
Lê bedewtir e ji te Berfespî, bi hezar carî
Ew ligel heft cûceyên biçûk û delalok
Li wî aliyê çiyayên madenan dijî

Dema ku qralîçeyê ev gotin bihîstin, ew wisa aciz bû, wisa qeherî ku hindik ma ji dil ve here. Hingê wê fam kir ku Berfespî dîsa nemiriye û di dilê xwe de got:

--Ez ê planeke wisa çêkim ku tu ê bi temamî ji rûyê dinyayê rabî.

Dora rojê, qralîçeyê rabû şehekî jehrdar çêkir, dîsa cil û bergên xwe guhertin û xwe xist şiklê pîrikeke din.

Pîrê selika xwe girt û ket ser riya mala cûceyan. Dawiyê gihîşt ber derî, li derî da û got:

--Min çi tiştên xweşik anîne, ka li van binêrin hele !

Berfespiyê ji paceyê nihêrt û got:

--Herin ji vê derê! Ez nikarim derî li tu kesî vekim.

Pîrê lê vegerand got:

--Lê qet nebe tu dikarî li vî şehê xweşik binêrî ha ! Ez ê porê te xweşik şeh bikim!

Feqîrê Berfespî dîsa ji tu tiştî neket şik û gumanê, jê re derî vekir û hişt ku pîrê porê wê şeh bike. Lê pîrê şehê jehrdar çawa xist nav porê keçikê, jehr tesîra xwe nîşan da û keçika ciwan ji hiş ve çû û ket erdê.

--“Ha ji te re! Êdî tu hew dikarî bibî ya herî delal!”

Pîrê wiha got û bi lez û bez ji wir bazda çû.

Gava ku dinya bû tarî, heft cûce jî vegeriyan hatin malê. Lê dema ku wan Berfespî li erdê bêruh û can dît, di eynî kêliyê de fikirîn ku ev şixul dîsa yê dêmariya wê ye. Îca ew ser keçikê geriyan û dîtin ku şehek di nav porê wê de ye. Dema ku wan şeh ji porê wê derxist, Berfespî bi ser xwe ve hat û çîroka xwe ya pîrê ji wan re got. Wan careke din li keçikê tembî kirin û gotin ku divê hay ji xwe bimîne û ji tu kesî re derî veneke.

Li aliyê din, dema ku qralîçe gihîşt koşka xwe, dîsa çû li ber neynika xwe sekinî û got:

--*Neynikê, neynika delal*

Kî ye ya herî bedew, li vî welatî?

Neynikê jî wek cara din bersiva wê da got:

--Qralîçeya min, tu pir bedew î li vî welatî

Lê bedewtir e ji te Berfespî bi hezar carî

Ew ligel heft cûceyên biçûk û delalok

Li wî aliyê çiyayên madenan dijî

Gava ku qralîçeyê ev tişt bihîst, ji hêrsan lerizî û bi qîrîn got:

--Heke jiyana min bi xwe jî bibe bedel, divê Berfespî bimire, ji rûyê dinyayê rabe !

Qralîçeya dilxirab piştre çû ket odeyekê ku tu kesî nikaribû biketayê û li wir sêveke jehrdar amade kir. Sêv ji der ve pir xweşik, spî û sor dixuya. Wisa xweş dixuya ku her kê ew bidîta dil dibijiyayê; lê belê perçeyeke biçûçik tenê jî bes bû ji bo kuştinê.

Dema her tişt amade bû, qralîçeyê dîsa ser û çavê xwe boyax kir û xwe xist şiklê jineke gundî. Wê xwe bi wî rengî guhert û ket ser riya heft çiyayên ku heft cûce lê dijiyan. Qralîçe gihîşt malê û li derî da.

Berfespiyê ji paceyê nihêrt û got:

--Cûceyan li min qedexe kir ku ez derî vekim. Ez nikarim kesî bigirim hundir!

Pîrê got:

--Temam, xem nake. Ez ê sêvên xwe bifiroşim kesên din; lê ez dixwazim hebek wek diyarî bidim te.

Berfespiyê got:

--Na, ez nikarim tu tiştî wek diyarî jî qebûl bikim.

Pîrê jê pirsî got:

--Ma tu ditirsî bi jehrê kevî ? Binêre : ez vê sêvê dikim tu perçe, tu ê perçeya sor bixwî, ez ê jî perçeya spî.

Sêv wisa bi hunerî hatibû çêkirin ku tenê aliyê sor bijehr bû. Berfespiyê nihêrt ku pîrê para xwe bi îştah dixwe, wê jî nema bi nefsa xwe karî û destê xwe dirêj kir û nîvê din ê sêvê, ku tijî jehr bû, ji pîrê girt.

Berfespiyê çawa gezek li sêvê da, lê hê danequrtandibû ku bêruh û can kete erdê.

Pîrê, yanî Qralîçeya zikreş bi awirên pir xirab li Berfespiyê nihêrî û bi tinazî got:

--Ha ha ha! Spî wek berfê, sor wek xwînê, reş mîna ebenozê haa! Vê carê êdî cûce jî nikarin te hişyar bikin !

Wisa got û ji mala Berfespiyê bi bazdan derket çû.

Û dema ku ew vegeriya mala xwe, çû dîsa ji neynika xwe pirsî:

--Neynikê, neynika delal

Kî ye ya herî bedew, li vî welatî?

Neynikê jî got:

--Qralîçeya min, tu yî ya herî bedew li vî welatî.

Wê çaxê dilê qralîçeya hesûd bi vê gotinê rehet bû, şa bû.

Êvarê dema heft cûce vegeriyan malê, dîtin ku Berfespî bêruh li erdê ye.

Cûceyan keçik rakir ser piyan, li ser keçikê geriyan ka tiştekî bijehr bi cihekî wê ve heye an na; kembera wê sist kirin, porê wê şeh kirin, ew bi av û şerbetê şûştin, lê tu tiştî feyde nekir: keçika delal miribû, ew wekî miriyan bû.

Cûceyan ew danîn ser darbestekê, li dora wê rûniştin û sê roj û sê şev li ser wê giriyan. Dûre rabûn amadekarî kirin ji bo ku wê defin bikin. Lê belê ew wekî mirovekî zindî dixuya û hinarikên wê wekî berê sor û delal bûn.

Cûceyan got:

--Em nikarin wê bixin bin axa sar, çênabe !

Îca ew rabûn ji bo Berfespiyê tabûtek ji camê çêkirin. Bi wî rengî mirov dikaribû ji her aliyî ve Berfespiyê bibîne. Piştre cûceyan keçik xist nav tabûtê û li ser jî bi tîpên zêrîn hem navê wê nivîsîn û hem jî gotin ku ew keça qralî ye. Paşê jî wan tabût danî ser girekî û her carê yek ji wan bi dorê nobedariya wê kir...

Berfespî demeke dirêj di nav tabûta şefaf de wekî mirovekî zindî, bi delalî raza. Lê piştî demekê kurê qralekî, yanî prensek, ku ji nav daristanê derbas dibû, bi tesadufî mala cûceyan dît û xwest şeva xwe li wir derbas bike. Gava wî dît ku li ser girê nêzî malê, di nav tabûteke şefaf de keçeke narîn û delal radizê, bi carekê dilê wî kete keçikê û ji cûceyan re got:

--Vê tabûtê bidin min, hûn çi bixwazin ez ê bidim we.

Lê belê cûceyan got:

--Tu zêrên hemû dinyayê jî bidî me, em wê nadin te.

Prens got:

--Wê çaxê wê wek diyarî bidin min. Çi ku ez kêliyek tenê jî wê nebînim, ez ê nikaribim bijîm. Ez ê wê weke yara xwe ya delal qebûl bikim û her dem qîmeta wê bizanibim.

Dema cûceyan ev gotin bihîstin, dilê wan bi prens şewitî û rabûn tabût dane wî.

Piştre muhafizên prens tabût danî ser milên xwe û ketin rê. Lê ew hê zêde neçûbûn ku, piyê yek ji wan muhafizan li kevirekî eliqî. Hindik ma ku hem muhafiz hem jî tabûta li ser milê wan bikeve erdê. Û ji ber hejîna tabûtê, ew perçe-sêv a di qirika Berfespiyê de bi carekê pekiya derket der. Piştre Berfespiyê çavê xwe vekir, devê tabûtê rakir û rabû ser xwe. Ew careke din zindî bû!

Berfespiyê bi şaş û metel pirsî:

--Ez li ku derê me ?

Prens bi kêfeke nedîtî bersiva wê da û got:

--Tu li ba min î.

Piştre jî prens behsa çîroka xwe kir û got:

--Ez li dinyayê ji her tiştî zêdetir ji te hez dikim; kerem bike bi min re were û bibe yara min.

Dilê Berfespiyê jî kete prens û pê re çû koşkê. Bavê prens ji bo wan daweteke muhteşem çêkir.

Lê çi tesaduf bû ku qralîçeya zikreş, yanî jinbava Berfespiyê jî ji bo dawetê hatibû vexwendin. Piştî ku qralîçeyê cil û bergên xwe yên herî delal û xweşik li xwe kirin, ew dîsa çû bi quretî li ber neynika xwe ya bisihir sekinî û pirsî:

--Neynikê, neynika delal
Kî ye ya herî bedew, li vî welatî?

Neynikê jî wiha bersiv da got:

--Qralîçeya min,
Li vê derê ya herî bedew tu yî
Lê bûk delaltir e ji te bi hezar carî

Jinbava zikreş pir aciz bû, ji qehran nezanî çi bike û dest bi çêrên xirab kir. Ew wisa tirsiya wisa tirsiya ku bi carekê hişê xwe winda kir, aqil lê nema û dîn bû.

Berfespî û prens jî heta dawiya emrê xwe di koşka xwe de jiyaneke xweş û bextewar derbas kirin.

Çîroka me qediya,
xêr û xweşî li hazir û guhdaran bariya.

-- 15/09/2005